Şevê mîratiyê diket
Li vî bîş û rêlî
Rojê li bin gerra he ya şêlî.
Şêrî dema eve bihîst
Rawesta û lêva xwe gest
Êkser qest kire hindavê
Dît wênê xo li bin avê
Lê nêrî pir tingjî
Gotê tu sax bî
Da min bikujî?
Nekir wekî nemerda
Xo bala kir û xo berda
Bilind bû û rabû
Li binê gerrê tena bû
Kêvrwîşka jîrdar
Bi zanist û zanînê
Li rêlî bû şwînwar
Bi huş û zanyarî
Bûye xudan li vî warî

شەڤێ میراتیێ دکەت
ل ڤی بیش و رێلی
رۆژێ ل بن گەڕا هە یا شێلی.
شێری دەما ئەڤە بهیست
راوەستا و لێڤا خوە گەست
ئێکسەر قەست کرە هنداڤێ
دیت وێنێ خۆ ل بن ئاڤێ
لێ نێری پر تنگژی
گۆتێ تو ساخ بی
دا من بکوژی؟
نەکر وەکی نەمەردا
خۆ بالا کر و خۆ بەردا
بلند بوو و رابوو
ل بنێ گەڕێ تەنا بوو
کێڤرویشکا ژیردار
ب زانست و زانینێ
ل رێلی بوو شوینوار
ب هوش و زانیاری
بوویە خودان ل ڤی واری.

**Peyv û raman:**

- Beş: Bêyum.. pê reş
- Bîvêr: Bive, tirsnak
- Rêl: Daristan
- Gerrav: Gerra avê, pengaw
- Xwîl: Xwar, çemay
- Tingijî: Enîgirê, tore, sil
- Bala: Bilind, berz
- Çerwan: Koz, çer, kwîveçer
- Hêv kirê: Lê nêrî, mêze kirê, berê xo dayê, seyirî kird

**پەیڤ و رامان:**

- بەش: بێیم.. پێ رەش
- بیڤێر: بڤە، ترسناك
- رێل: دارستان
- گەڕاڤ: گەڕا ئاڤێ، پەنگاو
- خویل: خوار، چەمای
- تنگژی: ئەنیگرێ، تۆرە، سل
- بالا: بلند، بەرز
- چەروان: کۆز، چەر، کویڤەچەر
- هێڤ کرێ: لێ نێری، مێزە کرێ، بەرێ خۆ دایێ، سەیری کرد

